| | |
|---|---|
|  *Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)* |  *wergera ji erebî: Mustefa Reşîd* |


# Tîrêjên Çarşembê

## Xelek - 55

# Gelo Pêximber Îbrahîm Hûrî bû?

## (beşê nehem)

## Dawerên Dîrokî

Evin li jêr hin dawerên dîrokî derbarê nasnameya hûrî ya pêximber *Îbrahîm*:

**Dawera yekem**: Ew dema dîrokî ku dîrokzan dibêjin, bi herhal di wê da, pêximber *Îbrahîm* ji *Ĥařan* çûye welatê Ken'an كَنْعان (Îsraîl / Filestîna niha), ew dem bixwe bûye ku *Kaşşî* (*Kassî*) bi hejmareka mezin ji herêma nawenda çiyayên Zagros ber bi welatê Babil va kişiyane (çûne), û Hûrî jî bi hejmareka mezin ji bakurê çiyayên Zagros û rojhilatê çiyayên Toros û rojavayê Kurdistanê (herêma Cizîrê) ber bi wî welatê ku paşê nav lêkirin Sûriya û Filestîn va kişiyane. Ji lew ra, Misiriyên kevin ji beşekî Sûriyayê û welatê Ken'an ra navê erdê (*Xarû* = *Xûrû*) yan jî (*Ĥûrû*) digotin[1]. Bi herhal koça malbata *Îbrahîm* jî beşek ji van koçkirinên Hûriyan ber bi başûr va bûye.

**Dawera duwem**: Di Tewratê da hatiye ku mezinê koleyên *Îbrahîm* rabûye {**û çûye Erama El Nehrên, çûye bajarê Naĥûr**}[2], û jinek ji *Îsĥaq* kurê *Îbrahîm* ra bi navê {**Rîfqet keça Betûîlê aramî, xwîşka Labanê aramî ji Feddanê Eram**}[3] aniye. Dîsa hatiye ku *Îsĥaq* ji kurê xwe *Ye'qob* يَعْقُوب ra gotiye: {**Ti jinan ji keçên Ken'an nebe. Rabe here Feddan Eram, mala Betûîl bavê dayîka te û ji xwe ra jinekê ji wir bîne, ji keçên Laban, birayê dayîka te**}[4].

"*Eram El Nehrên*" û "*Feddan Eram*" du navin ji bo herêma navîn ya Mêzopotamiya (navbera çemên Dijle û Ferat). Bajarên wek Nisêbîn, Qamîşlo, Ĥeřan, Ûrfa, Mardîn û Sirûc hemû di vê herêmê da ne. Peyva "*Feddan*" bi zimanê suryanî tê maneya "deşt". Mebest bi peyva "*Eram*" jî gelê *Erame*, yanê *Aramî*. Ev hin êlên samî ne, pêl bi pêl di sedsala 14-an b. z. da ji biyabana Sûriyayê derketine. Di destpêka sedsala 12-an b.z. da derfeta ketina padîşahiya Mîttanî-Hûrî standine, û herêmên Hûrî-Mîttanî û bakurê Sûriya hundirîn û nawenda wê dagîr kirine, û di van herêman da padîşahî avakirine. Piştî ku Aramiyan Kirîstiyanî wergirt, dev ji navê xweyî kevin (Aramî) berdan, ji ber ku ew bi dema pûtperestiyê va girêdayî bû, û navê (Suryan) li gor navê Sûriyayê wergirtin.

Sebaret bi (*Naĥûr*) jî, ew bavpîrê *Îbrahîme* û bajarê (*Naĥûr*) bixwe jî (Ĥeřan)-e. Belkî ji dubarekirina navên (*Eram Nehrên, Feddan Eram, Betûîlê aramî, Labanê aramî*) bê bawerkirin ku ew herêm di wê demê da aramî bûye û ku malbata *Îbrahîm* jî aramî bûye. Di rastiyê da vegerandina herêmê ser Aramiyan ji çewtiyên tomarkerên Esfarên Tewratê ye.

Lêkolînerên dîrokî derbarê herêma rojavayê Asiyayê, ji wê bîr û baweriyê ne ku *Ĥeřan* û derdorên wê bi rojhilat, rojava, bakur û başûr va di wê serdemê da hûrî bûye û padîşahiyeka Hûriyan li wir hebûye, paytextê wê Ûrkîş bûye. Hîngê çawa ew herêm wê bibe (*Eram Nehrên, Feddan Eram*) di wê dema ku ew hûrî bû û hên Aramiyan ew dagîr nekiribû?

**Dawera sêhem**: Herdu lêkolîner *Abraham Malmat* û *Hayim Tedmor* pisporên dîroka Îbrî ne. Ji navên wan xuyaye ku ew herdu jî Îbrî ne. Wan gotiye ku Hûrî pêş sedsala 15-an b.z. "**li herêma Ĥařan belav bûne, berê xwe dane herêma Sûriya û Filestînê, şêwazê jiyana xwe li ser hevedudaniya nijadî kevin ya senseletên îbrî ferz kirine û her wisa, di demeka pir piştî wê da, li ser Esbat (êlên) benî Îsraîl jî**"[5]. Ev agahdarî piştrast dike ku hin êlên Îbranan bi koka xwe hûrî bûne. Divêt em jibîrnekin ku Îbran pêximber *Îbrahîm* wek bavpîrê xweyî yekem dibînin.

**Dawera çarem**: Dr. Seyid El Qimni dibêje: "**Heger Tewratê Îbrahîm (eleyhî selam) wek mirovekî Aramî daye xuyakirin, em jî gihîştine wê baweriyê ku ew Hûrî jî bûye. Heya niha jî zaravayê Şamê ev nav bi vê maneyê parastiye. Mirovê ayînê, oldar (Xûrî) ye û tîpa "x" bi tîpa "ĥ" tê guhartin. Ev nîşan wê yekê dike ku kesên bi mijarên ayînî xerîk bûn, bi piranî ji nijadê ĥûrî bûne**"[6].

**Dawera pêncem**: Birêz *Emile Burnouf* di pirtûka xwe da "*Science des religion*" dibêje ku gelê Cihû ji du nijadan pêkhatiye: Yekem samî (biyabanî) ku piraniya gelê îsraîlî pêktîne û duwem kêmaniyek ku bi herhal ji Ariyanên çiyayî ne, ewên ku li çiyayê Celîl li bakurê Ûrşelîm rûniştibûn[7]. Ew Ariyaniyên ku *Burnouf* qala wan dike Hûrî ne, ku di kelepora Îbranî da (êla *Îbrahîm*)in. Dibe jî ku hinek Hûrî hên pêş koça *Îbrahîm* li welatê Ken'an bi cih bûbin.

**Dawera şeşem**: *Dr. Naêl Hennun* نائل حَنّا derbarê *Noah Kramer*, zaniyarê pispor di lêkolînên sûmerî da, dibêje: "**Tiştê biyanî û balkêş ewe ku Kramer di gotinên xwe da derbarê Samiyan, Îbraniyan ji wan cuda dike û diyar dike ku, tevî cudahiya zimanî, peywendiyeka xwînî (nijadî) di navbera wan û Sûmeran da heye û ew - li gor baweriya wî - Îbraniyan, ji bilî neteweyên din yên samî, wek berdewamiya dîrokî û şaristanî ji Sûmeran ra dibîne**"[8].

*Naêl Hennun* ji tiştê ku *Kramer* gotiye ne razî ye; ew dixwaze Sûmerên çiyayî têxe nav samiyên biyabanî. Me berê nîşan bi wê yekê kiribû ku Sûmerî, Sûbarî û Hûrî gişt vedigerin ser yek erdnîgarî, yek çandê û yek nijadî. Di rastiyê da gotina *Kramer* piştgiriya koka hûrî ya êla *Îbrahîm* dike. Lê mijara cudahiya zimanî di navbera îbranî û sûmerî yan jî hûrî da, bi me ra derbas bû ku nifşê çarem ji senseleta *Îbrahîm* zimanê xweyî resen (hûrî) jibîrkirin û êdî bi zimanê Ken'anî peyivîn ku paşê nav lêkirin (îbrî).

**Dawera heftem**: *John B. Noss* gotiye: "**Îbrahîm di wê demê da ji Ĥeřanê koç kiriye, dema ku talana Hindo-Ariyanî li dor sala 1750 b.z. nêzîk bûye. Dibe ku ew û êla wî ji pêşengên wan komên ku ji welatê xwe hilbûn û ber bi başûr va çûne bin. Ji hinek van komên belavbûyî ew talanker pêkhatin ku navê Hêksûs li wan hatiye kirin. Piştî ketina Hêksûs bo welatê Misirê, malbata Îbrahîm da pey wan, û çû erdên here berhemdar li sêkoşeya (Delta) çemê Nîl ku Hêksûsan bi êla Îbrahîm ra wek hevpeyman dan û standin kirin**"[9].

*John Noss* destnîşan dike ku gelên ariyanî çiyayî ji herêmên bakurê çiyayên Zagros û rojhilatê çiyayên Toros kişiyane; *Kaşşî* ber bi Îraqê va çûne û li wir padîşahiyek avakirine û xizimên wan yên *Hûrî* û *Hêksûs* ber bi Sûriya û Filestînê va çûne. Li wir hin êlên samî tev li *Hêksûsan*

bûne, Misir talan kirine û di navbera salên 1675 - 1570 b. z. li wir desthilatdarî kirine. Divêt em bêjin ku peyva "*Hêksûs*" navekî Îgrîkî (yûnanî) ye. Misiriyan ji wan ra gotiye "*Shashu*" (*Şaşû*)[10].

Niha ma ku em li dawerên *Philologie - Ethymologie* bikolin, ka gelo di wan da ti tişt heye ku piştrast dike *Îbrahîm* vedigere ser Hûriyan?

Çarşemb, 13.04.2016

## Jêder

[1] Flakowski: Demên tevliheviyê, 219. Abraham Malmat, Hayim Tedmor: Îbranî û Beno Îsraîl, rûpel 83.
[2] Sifera Pêkhatinê, Eshah, 24, ayet 10.
[3] Sifera Pêkhatinê, Eshah, 25, ayet 25.
[4] Sifera Pêkhatinê, Eshah, 28, ayet 1- 2.
[5] Abraham Malmat, Hayim Tedmor: Îbranî û Beno Îsraîl, rûpel 118.
[6] Seyid El Qimni: Pêximber Îbrahîm, rûpel 71.
[7] Maurice Olander: Zimanên bihuştê, rûpel 163.
[8] Naêl Hennun: Rastiya Sûmeran, rûpel 24.
[9] Firas El Sawah: Berfirehiya dîroka ayînan, pirtûka pêncan, rûpel 99.
[10] Firas El Sawah: Berfirehiya dîroka ayînan, pirtûka pêncan, rûpel 97 - 98.